

# RÊBERA PIRATI KI JIBO FÊRBÛNA PIŞTEVANIYA NAVNETEWÎ LI ITALYA



MINISTERO  
DELL'INTERNO

Komisyona Netewî ya Mafê Penabertiyê



# NAVEROK

1. Ev rêberê jibo çiye?.....4
2. Daxwaza wergirtina Piştgiriya Navneteweyî.....6
3. Maf û erkên penaber.....17
4. Pirsge.....20
5. Nirxandina daxwazname û encamên wê.....23
6. Maf û erkên piştî erêkirin piştgiriyan...33
7. Corên din yên destûrnameyê .....37
8. Navnîşan û hêjmar .....39

# 1. Ev rêberê jibo çiyê?

Eger tu ve rêberê dixwini, ev tê wê wateyê **tu li Italya yi** û te jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî daxwazname şandiye,

yan ji dixwazi daxwaznameyê jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî bigirî. Tu dikari li vir agahiyên derbarê **çawaniya bidestxistina** pevajoya **Piştgiriya Navnetewî** ,regezên ku di nixandina daxwaznameyan de tên bikaranîn û **maf û erkên** xwe, bi dest bixî.

Evê rêberê bi baldarî bixwînin, li cem xwe bigirin û her dema ku pewîst kir, bi şêwirmendan re parvebikin. Ev rêberê bi te dide zanîn ku di her astekê pevajojê de bizanî ka çi dibe.

Eger hinek peyvên vê rêberê ji te re zelal nebun, dikarî ji berpirsên zagonî yên li Navenda Pirsgeha Encuma Taybet ya alîkariya Herêmi **daxwazi biki ku alikariya te bikin**. Derbarê çavkanî û wateya naveroka vê rêbera li ber destê te ye.



Ev xêz kurteyek ji 6 pêvajoyên erekirina Piştgiriya Navnetewî nişan dide. Hevdem li gel xwendina vê rêberê, agahiyên zedetir derbarê van pêvajoyan de bi dext bixin.

1

### Navneteweyi

Ev merhele ragihandina zûyadaxwaza te ji bo standina daxwaznameya ji vergirtina Piştevaniya Navneteweyi, ji bo navendên polêsan, ango polêsên sinorî digire ber xwe.

2

### Naskirin

Merheleya naskirinê, ji hewlên ku poles ki bo qeydkirina agahiyên li bara te (nav, paşnav, cih û diroka jidayikbunê, netewe) girtina wêne û tiliya te pêk te.

3

### Fermîkirina daxwaznameyê

Ev merhele ji nivisandina kaxezên taybet ên qeydkirina daxwaznameya te ji bo wergirtina Piştevaniya Navneteweyi pêk tê.

4

### Hevpeyvîna li Komisyona Herêmi

Ev merheme ji hevpeyvîna li bara Tiştên ku te bi çavê xwe ditine û dibe sedema tirsê û yekê ku tu vegeri welatê xwe, pêk tê.

5

### Nirxandin û Biryardan

Di vê merheleyê de Kompisyona Herêmi nirxandinên pêwîst dike û li ser daxwaznameya te ji bo wergirtina Piştevaniya Navneteweyi biryarê dide.

6

### Daxwaza Venêrînê

Di vê merheleyê de derfet ji te re tê dayîn ku li ser biryara komisyona Herêmi daxwaza venêrînê biki

# 2. Daxwaza jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî

## Piştgiriya Navnetewî çiye?

Piştgiriya Navnetewî pekhatiyê ji mafên bingehîn yên ku ji aliyê welatê Îtalya ve **jibo** penaberan **bi fermi hatine naskirin**.

**Penaber** ji wan kesan re tê gotin ku ji ber sedemên bi tekildari nijad, ol, netewe, fikren siyasi yan ji endambuna di rexistina civaki de nikarin vegeerî welatê xwe û rasti îşkence û lêdanan bîn û nikarin alikariya welatê xwe wergirtin. Ji bo agahiyên zedetir di derbarê vê mijarê de serdana rûpela 26'an bike.

**Xwedî maf û wergirek alikariya berfireh** ew kesin ku penaber nayên jimartin, lê di welatê xwe de rastî gefên weke (sêdarêdan, îşkence, reftarên dijmirovî, gefa mirinê jiber şerên çekdarî) dibin. Jibo agahiyên zedetir di DERBARÊ VÊ MIJARÊ de serdana rûpela 27'an bike.

Piştgiriya Navnetewî berî her tiştî **misoger dike ku** ew kes **xwedî vi mafî ye ku radeşti welatê xwe neyê kirin û li Îtalya bimine**.

## Gelo ez dikarim ji bo wergirtina

## Piştgiriya Navnetewî daxwazan bikim?



Eger tu hemwelatîyê Ewropa nebî û jiber tirsî îşkencê û her weke din yan jiber tirsî gefa mirinê nikaî vegeerî welatê xwe;



Eger mafên te yên hemwelatîbunê tune 3u jivê yeke ditirsî ku eger vegeerî welatê xwe, rastî zext û zorê werî, yan ji ber rastî gefa mirinê werî.



*Eger ii gor te rewşa te ya heyî ne li gorî di çargoveya rewşên heyî de ye, lê ji ber hin sedemên din dixwazî ii Itaiyayê bimini, alikariye ji pişporên xwe yên zagonî bixwaze bila di vê derbarê de te aqahdar bike. Serdsana rupela 37an bike.*

## Kingê û çawa dikarim daxwaznameya xwe jibo wergirtina Pişgiriya Navnetewî pêşkêş bikim?

Daxwaznameya xwe **demek ji ya din zutir pêşkêş bike.**

Dikari dema ku teyi Itaiyaye, daxwaza xwe jibo pêşkêş kirina daxwaznameye jibo wergirtina Pişgiriya Navnetewî pêşkêşî **navenda polêsên sinori** yan ji eger niha li Itaiya bi, seri ii ofisên heri nêz yên polêsên penaberiyê **yên navendên polêsan** bidi u daxwaza xwe ragihini.

Heta eger tu hatibi girtin, yan li Girtîgehên Taybet yên Vegerandina Penaberan bo Welatê Wan (DCR)" de yi, disa dikari ji bo wergirtina Pişgiriya Navnetewî daxwaza xwe biki.

Daxwazname **kesîne:** Her keseki nezarok divê bi xwe daxwaznameya xwe radest bike. Eger zarokek ku temenê wî/wê yê zagonî hindik be, li welatê Itaiya hebe, ji kerema xwe ve yeke ji saziyên peywendîdar re ragihinin, bi vi awayi daxwaznameya te jibo wan jî pêbawer dibe. Eger temenê te ji 18 salan kemtir e û eger bi tena serê xwe ii Itaiya yi, disa dikari bi alikariya çavdêreki ji navenda ku lê dimini, ji bo wergirtina Pişgiriya Navnetewî daxwaza xwe pêşkêş biki.

## Gelo divê ez pere bidim?



Pevajoya serlêdana wergirtina Pişgiriya Navnetewî bê pere ye.

Berpîrsên Îtalî bi ti awayi ii hember daxwaznameya te ya ji wergirtina Pişgiriya Navnetewî pereyan ji te nastinin. Eger kesek ji te re beje, yan kareki bike ku tu wer bizani ji te pereyan dixwaze, ve yeke ji berpîrsan re ragihinin.

# Wê Kijan welat daxwaznameya min jibo wergirtina Pişgiriya Navnetewî binirxine?

Ew welatê ku divê daxwaznameya te ji bo wergirtina Piştgiriya Navnetewî binirxine, ji aliyê Rêzicknameya Dublinê ve hatiye diyarkirin.

**Rêzicknameya Dublinê** zagoneke Yekitiya Ewropa (YE) ye ku ji hin rêzikên jibo diyarkirina welatekî Ewropî pek tên ku ew welat dikare daxwaznameya te binirxine. Ya ku tu daxwaznameya xwe jibo welatekî Ewropî ye taybet dişîni, vê yeêe misoger nake ku yeqin ew welat wê daxwaznameya te binirxine.

Pêş nirxandina daxwaza te jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî, ew welatê Ewropî ku tu lê yî, bi xwe diyar dike ka ew welat dikare daxwaznameya te binirxine yan na, her wiha diyar dike ku gelo divê daxwaznameya te ji bo welatekî din yê Ewropî bê şandin yan na. Li nexşeya rupela II'an binêre, di wir de 32 welatên Ewropî ku Rezikên Dublinê bi kar tînin, hatine diyarkirin

Rezikên Dublinê hin sedema vedibêjin ku li gor wan welatek dikare bi awayê zagonî daxwaznameyan jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî binirxine: Hebûna endamekî malbata we li welatekê ku ev rezik lê hene, vê rastiya ku vîza yan destûrnameya te ya mayînde heye, yan hebûna ku ji hêla welatekî endamê vê rêzicknameyê ve hatiye dayîn. Ev rastiya ku tu bi awayê zagonî, yan derzagonî ji sînor derbas buyî û gehiştî welatekî endam. Carnan ji ev zagona dawiyê tê bikaranîn. **Yekem welatê Ewropî ku tu derbasi wi buyi, welatek e ku hejatiya zagonî jibo nirxandina daxwaza te ya jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî heye** (wek mînak eger welatê Îtalyayê yekem welate ewropî ye ku tu ghiştî wir, wê welatê Talyayê daxwaznameya te jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî binirxine).

Eger te li welatekî din ku pabendê zagon û rezikên Dublinê ye, hin kes û karên te hene û dixwazî ku tevî wan bibî, di vî warî da digel karkerên navenda wergirtinê ku tê de dimîni yan li gel pisporekî yan rasterast digel Polês bi axive.

Destura hevpeyvîneke nehênî li gel karkerên giştîpirsiyê bi zimanê xwe yan bi zimanê ku dikarî fam bikî, bigire. Ev gelek girînge ku di vê hevpeyvînê de her cure zanyariyên sudmend u kêrhatî, bi taybet zanyariyên têkildarî hebûna kes û karên te li welatekî din yê endamê Yekitiya Ewropayê, her wiha her cure belge û dokumentên ku li ber destê te hene, raber bike. Armanca vê hevpeyvînê biryardana derbarê pêwistiya te bi wergirtina Piştgiriya Navnetewî nine, belkî armanca vê hevpeyvînê diyarkirina welatekê ye ku şayana zagonî heye jibo pêkanîna vê nirxandinê. Daxwaznameya te de ji aliyê ofisek girêdayî Wezareta karên hundir ku jêra "Yekineya Dublinê" te gotin, were lêkolîn kirin.



Tu dikari di welatê ku kes û karên te li wir dijîn, bi awayeki zagonî tevli wan bibi û pêvajoya xwe di vi welatê navbiri û di şert û mercên heyi da bidomîni:



**Eger tu gehiştî temenê zagon, tu dikari bi awayeki zagoni tevli** zarokên xwe ku di bin temenê zagonî de ne bi merê xwe **yan** hevjiya xwe (**û di hin mijaran da hevparê/a jiyana te**) bibi, helbet eger ev kes li welatê ku tede ne, penaber, kese xudan piştgirîya temamkirî yan penaxwaz **tên zanin**.



Di rewşa ku **ducani bi, vê dawiyê te zarok anibe, tuşi nexweşiya giran yan nivîşkaniya giran bi yan kal bi**, dikari tevli zarok, bira yan xwuşk yan yek ji dêbavên xwe bibi, helbet eger tu giredayi bi **alîkariya wan bi** yan yek ji wan giredayi bi alîkariya te be.



Eger ku te beriya hatina bo Îtalya **daxwaznameya xwe jibo yek ji reveberên berpîrs di yekî din ji welaten endamên Yekitiya Ewropayê da raber kiribe**, li gori zagonên Dubline, welatê ku te daxwaznameya xwe raberi wê kiriye, wek berpîrsa nîrxandina dosyeya te, dê were diyarkirin. Eger daxwaznameya te hatibe redkirin, tu dikari ji rayedarên berpîrse dadweriyê yê heman welatî daxwaza venêrinek nû biki da dilniya û piştirast bi ku biryara hatî dayîn rast û di cih deye.



Eger beriya çuyina bo welateki din yê endamê Yekitiya Ewropayê, **te daxwaznameya xwe dabe welatê Îtalya**, di gellek deman da li gori zagonên Dublinê, welatê Îtalya welatê xudan hejatiye jibo nîrxandina daxwaznameya te jibo wergirtina Piştgirîya Navnetewî de weri diyarkirin. Eger tu daxwaznameya xwe ya ku te da ye welatê Îtalya betal biki, ev yek dibe sedemê guhertina welatê xudan hejatiya zagonî jibo nîrxandina daxwaza te nebe.

Ji bîr neke ku eger tu vê biryara dayî li yek ji welatên endamê Yekitiya Ewropayê li gori veguheştina te jibo welateki din ku xudan hejatiya zagonî jibo nîrxandina daxwaznameya te ye, nepejirine, ev mafê te heye ku daxwaza xwe ya Venêninê bidi dadwer. Eger te têra xwe hêza abori jibo vê mebestê li ber dest tunebe, te ev maf heye alîkariyên mafdariye yê belaş û bê pere werbigiri.

# Eger tu keseki di bin temenê zagonî û bê hevre yî

Eger tu keseki di bin temenê zagonî û bê hevre yî û kes û karên te li yek ji welatên endamê Yekitiya Ewropayê ne, tu karekî jibo çuyina bi tenê bo wî welati neke û terka navenda ku li wir dimini, neke. Vê mijarê ji berpîrsên navendê ya Polls ra beje ku te dil heye tevli kes û karên xwe bibî.

Tu dikarî bi belgeyan 0 bi awayekî tam dilniya û bi ewle bi wî welati da ku bi awayê zagonî tevli dayika xwe, bavê xwe yan kesekî din yê mezintir ku bi awaye yê zagonî berpîrsê xweye yan bira, xuşk, mam û met yan xal û xaletên xwe yan bavkal û dapira xwe ku dikarin çavdêriyê li ser te bikin, bibi. Kes û karên ku te dil heye tevli wan bibi, divê bi awayekî zagonî li welatê ku li wir dijîn, bimînin.

Ji bilî vê, eger tu kesek dibin temenê zagonî û bi hevre yî, ev derfet heye ku daxwaznameya te di heman welatê ku niha lê dimini, were nixandîn.




## Baldarî

- Eger welatê ku hejatiya zagonî jibo nixandina daxwaznameya te heye, welate Îtalya be, lê tu gera xwe bidomîni û li yekî din ji welatên endamê Yekitiya Ewropayê jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî daxwaz bikin dibe ku tu bo Îtalya weri vegerandin.
- Eger tu beriya ghiştina welatê Îtalya derbazi welatekî din yê Yekitiya Ewropayê bubayi ku sozdare rêzik û zagonên Dublinê ye, dibe ku bo WT welati beyi vegerandin

*Jibo wergirtina agahiyên zêdetir, ji pisporekî mafzan ii navenda ku lê dimini, yan ji civateke taybetî piştevaniya ji penaxwazan an ji parezerê xwe daxwaza alikariyê bike.*

# Kîjan welat rêzikname û zagonên Dublinê bi kar tînin?

28 Welatên endamê Yekitiya Ewropayê (yani Otriş, Belpika, Bolgaristan, Qibris, Krowasi, Danmark, Stoni, Fenlanda, Fransa, Almanya, Yunan, Irlenda, Italya, Letoni, Litvani, Lokzamburg, Malt, Holanda, Pola (Lehistan), Portegal, Englistan, Komara çek, Romanya, Slowaki, Sloveni, Spanya, Swed u Hongari) û welatên Swisre, Norweç, Islend u Lixtin ştayn.



# Pêvajoya raberkirina daxwaznameyê jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî çiyê?

**1) NASKIRIN:** Pişti ragihandina armanca te jibo daxwaza wergirtina piştgiriye, polls de tèn bike û nasnameya te diyar bike: Polls zanyariyên kesî (Paşnav, cih û roja dayikbunê, netew) tomar bike û de çend wêneyan ji te bigirin. Eger ku **tu 14 salî yan kêmtir bi**, rayedarên berpirs dê ji tiliyen te ji wêneye bi girinin ("şopa Tiliyan") û dê wê jibo navenda daneyan ya Ewropi ku jêre "Eurodac" tê gotin, bişînin. Jibo pêkanîna van pêvajoyan, tu heri zêde bi qasî 1 mehê de li nav avahiyeke taybet weri ragirtin. Di dawiya vê dewreyê da, eger selimandina pênasê û welatibûna te pêgan nebube, renga ku te biginin "**Girtigehka taybeti vegerandina kesan bo welatê wan**", û renga heri zêde heta **6 mehan** te li vê navendê ragirin.

**2) FERMIKIRINA DAXWAZNAMEYÊ:** ev qonax pêktê ji amadekirina formeke ku jêra Forma **Model C3** tê gotin. Polis dê çend pirsan tekildari naskirin û rewşa kesî ya te (Nav, paşnav, roj û cihê ji dayikbunê, netew, mala niha, hurgilliyên tekili girtinê, asta xwendinê, kar, mezheb, cihê mayinê, zimanên ku dizani), malbata te û sefera li pêşberî te bipirse. Polis dê ji te bixwaze ku danasineke kurt derbarê egera terikandina welatê sereke û sedema nezivirina te bo wi welati raber bike. Eger bixwazi dikari belgeyeka niviski (bi zimane îtalî yan zimaneki din) ji raber biki û te de sedemê hatina xwe rave biki. Eger tu bi zimanê îtalî nizani, te ev maf heye ku alikariya **wergêreki devki** bi kar bini.

Eger te passport heye divê wê bidî Polis. Kiryareke din ya sudmend eve ku hemu belgeyên ku di dema hatina jibo îtalya da li ber destê te ne û her wiha hemu belgeyên ku te li pey hev ji welatê xwe yê sereke wergirtine, raber biki (wek minak: Destura seferê, belgeya zewacê, belgeya bijîşkî, wêne, nivisarên rojnameyê): Bi vi awayî tegihiştina buyera çêbuye û wergirtina agahiyên zêdetir derbarê rewşa te, de wê hêsantir bibe.

Nemaze eger:

- Temenê **te** kemtir ji **18 salî ye;**
- Tu bi **nexweşiyê giran ketî;**
- Tu **bav yan dayikeki ku zarokên te dibin temenê zagonî de hene;**
- Tu jinekê **Ducani yi;**

- Tu lêqewman **û kêm-endami**;
- Te pêwîstî bi **alîkariya derunnasiyê heye, tu ji Işkencê, neşê bikaranina bedenî û derûni yan zayendi yan reftara cudahiya nijadi ji ber nêrin yan pênasexa xwe ya zayendi reviyi, tu qurbanî sinetkirina jinani**;
- Te pêwitiyên taybet yên din hene.

Bilez di gel polisam amade li navenda wergirtinê ku lê dimini, civateke taybet a pişgiriya ji pênasxwazan yan li gel parezerê xwe di vi wari da bi axive.

Di van rewşan da, dibe ku te ev maf hebin:

1. mayina li avahiyeke taybet (wek minak: navenda taybet? kesên dibin temenê zagonî yan avahiyên parasti jibo kesên ku li ber xetera ne bikaranina zayendi ne);
2. ketina bin çavdêriyê yan wergirtina alîkariyê ji aliyê **karkerên pispore yên piştgiriye** (dixtor, derûnnas, alîkariya civakî);
3. **Nimûneyek ya serlêdana xwe ya destpêkê li gel xwe bigire:**

Forma C3 model divê ji aliyê te, polis û wergerê/a devki ku alîkariya te kiriyê ve were tomakirin û eger temenê te dibin 18 salî yê be, ev form divê ji aliye sergerê (wateya ve peyve di rupela 16 da bixwine) te yan ji aliyê çavderê amade li navenda mayina te ve were tomakirin. **Tu yê nimûneyekê wajokiri ji Forma "Model"** û belgeyên raberkiri werbigiri.



## HIŞYARÎ

**Eger zanyariyên peywendiyê yên te hatin guhertin** (cîhê jiyane yan hêjmara telefona te) **divê vê yekê** ragihine polis û Komisiyona Navçeyî da ku bikari daxuyaniyên têkildari daxwaza te jibo wergirtina pişgiriye, her wiha demjimêr û roja hevpeyvina te li gel Komisiyona Navçeyî werbigiri. Ji ber vê yekê, ji kerema xwe paragrafa bi navê "Ezê çawa ji biryara hati dayin haydar bibim?" di rupela 29 da bixwine.

# Xalên Nehênî

Agahiyên heyî di daxwazanmeya te ya jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî da Nehênine. Hemu kesên ku dê vê daxwaznameyê lêkolîn bikin, ji wan Polis, erkdarin ku Soza Nehênîbunê bigirin. Di rastiyê da, li gori zagonê, rayedarên berpirs yê ïtalya bêyi razibuna te, agahiyên tekildari daxwaznameya te jibo wergirtina piştgiriya yan her agahiyeke din ku te an malbata te, digel tu keseki biyani, ji wan rayedaren welate te ye sereke, de parve nekin.

## PARASTINA DANE Û AGAHİYÊN KESÎ

Di dema tevahiya pêvajoya tekildari daxwaznameya jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî da, her wiha di heyama pêkanina nixandinan li gori zagon û rêzîkên Dublinê, dane û zanyariyên hestiyar yê tekildari te de werin berhevkerin (Agahî û hurgiliyên kesî, şopa Tiliyan, belge û hwd) ku jibo pêkanina vê pêvajoyê û têgihiştina pêwistiyan te jibo wergirtina Piştgiriya, pewist in, her wiha jibo rayedarên berpirs yê welatên Ewropî jibo tomarkirina hatin û amadebuna te li welateki, kêrhatî ne.

Ev dane û agahî tenê jibo armancên ku ji aliyê zagonê ve hatiye diyarkirin, dikarin bî bikarabnin û ev agahî hertim bi awayeki parastî û bi ewle li nav baregehên daneyan yê kampanyoteri yê taybet da tî ragirtin û tenê tu û karkerên rêpêdayi yê rêveberiyên tekildari di vê pevajoeyê da, dikarin wan bibinin.

Ev baregehên daneyan pêkhatine ji van mijaran:

- **Vesta.net:** Ev malpera daneyane li welatê ïtalya ye û ji hemû agahiyên tîkildari daxwaznameyên taybet jibo wergirtina Piştgiriya Navnetewî pêkhati ye;
- **Dublinet:** Ev malpera daneyan pêkhati ji agahiyeÊ tekildari pêkanina nixandinan bi mebesta diyarkirina welatê xudan hêjatiya zagon jibo nixandina penabertiye ye
- **Eurodac:** Ev malpera daneyan pergaleke elektroniki ye ku şopa tiliyan pênxwazan bi armanca tomarkirina vê yekê ku gelo kesê tekildar ji rêya

sinor ve derbazî yek ji welatên endamê Yekitiya Ewropayê buye yan na u / an daxwaznameya penabertiyê raber kiriye yan na, tomar dike.

Di tevahiya vê pêvajoyê da mafê te heye ku:

1. bizani ku kijan rêveberiya xudan hêjatiya zagonî jibo pêkanina pêvajoya Dublinê ne û kijan rêveberî û rayedar berpîrsê ragirtin û parastina dane û agahiyên te ne;
2. Dikari dane u agahiyên têkildari xwe bibini;
3. Hin agahiyan derbarê şêwazên sererastkirin û jêbirina agahiyên navbiri werbigiri;
4. Daxwaz biki ku eger agahi û daneyên te (Ji wan dane û agahiyên heyî li malpera daneyan ya Eurodac nerast in, werin sererastkirin yan daxwaz biki eger dane u agahiyên te bibinpekirina zagon û rêzikên têkildar û heyî hatine proseskirin, bîn jebirin.

## Ez keseki dibin temenê zagonî ê bêhevrê me, divê çi bikim?

Eger temenê te dibin 18 sali ye û tu kes û kar digel te nine, bilez vê mijare ji polis û karkerên navenda wergirtina xwe ra bêje da ku bikari misogeriyên **taybet jibo kesên bin temenê zagonî û bê hevrê li welatê îtalya bi kar bini.** Ev misogerî tê wê wateyê ku:

- Tu yê li navendeke taybet bi kesên dibin temenê zagonî de weri bicikirin;
- Dadwerek, yan keseki berpîrs u xwedan hejati bi mebesta rênişandan û piştevaniya ji te li welatê îtalya û parastina mafên te diyar bike. Ev kes her wiha dê alikariya te di pêvajoya têkildari piştrastkirina wergirtina Pişgiriya Navnetewî bike;
- Eger her yek ji kes û karên te bi awayê zagonî li welateki din yê endamê Yekitiya Ewropayê dijin, dikari daxwaza tevlibuna li wi/ê bidi;
- Dê nixandina daxwaznameya te ya wergirtina Pişgiriya Navnetewî bikeve ewlehiyê.

Eger te **nasname (ID)** yan hin bawername hene ku temenê te di selimine, bilez wan nişanê bide. Eger ku gumaneke ciddî li ser temenê te yê dibin asta zagonê de hebe, rayedarên berpirs yê welatê îtalya dibe ku hevpeyvînek li gel bijîşkek yan pisporekî din jibo te amade bikin. Di dewama vê hevpeyvînê da, ceribandînê bijîşkî bi mebesta piştrastkirina temenê te dê pêk bîn. Lê nerinên te yê giştî, tenê ji aliyê kesên pisporekî ve û bi alikariya wergêrekê devkî ku zimanê te fam dike, dê pêk were.



## 3. MAFÛ ERKÊN DAXWAZKER

Jibo serlêdana daxwaznameya wergirtina Pişgiriya Navntewî, tu dibi "**daxwazker**". Daxwazkeran hinek maf û erkên xwe hene.

### Gelo Maf û erkên min çi ne?

**HEVKARI:** Tu divê di hemu mijafan da bi rayedarên berpirs ku erka pêkanina pêvajoya piştrastkirina Pişgiriya Navntewî raberî wan hatiye kirin **hevkarîyê biki**, û vi kari ji rêya, **raberkirina hemu belge û agahiyên** sudmend û kêrhati jibo raberkirin û nirxandina daxwaznameya xwe, pêk bini.

**HER CORE GUHERTINÊN DI NAVNÎŞANA XWE DA RAGIHINE:** Tu erkdari ku **eger navnişana cihê mayina te yan cihê jiyana te hatiye guhertin**, wê yekê ji polis ra ragihini **da ku bikare di hemu deman de** li gel te bikeve tekiliyê. Eger vi kari neki yan eger navnişaneke şaş raber biki, derfeta wergirtina agahiyên tekildari daxwaznameya xwe ya bo wergirtina Pişgiriya Navntewî ji dest didi (Jibo wergirtina agahiyên bêhtir, seri li Paragrafa bi navê " Ezê çawa ji biryara hati dayin haydar bibim?" di rupela 29 da bide).

**JI BO HEVPEYIVINÊ AMADE BIBE:** Tu erkdari ku di roj û demjimêra diyarkiri li daxuyaniyan, jibo pêkanina hevpeyivinê **di Komisyona Navçeyi da** amade bibi. Tevi vêya, ji ber sedemên ku rê li ber amadebuna te li hevpeyivinê digirin, daxwaz bike ku hevpeyivin paşda were avêtin. **Vê mijarê bi lez ji Komisyona Navçeyi ra ragihine;** Eger tu li navendekê dimini, ev navend dê jibo vi kari alikariya te bike.

**LI NAV AXA ITALYA BIMINE:** Di tevahiya dema vê pêvajoye da nabe ku axa îtalyayê biterikini. Eger tu daxwaza Piştevaniya Navnteweyi li welateki din yê Ewropi raber biki, dibe ku jibo îtalyaye weri vegerandin.

**ŞOPANDINA ZAGONÊN ITALYA:** Erka te ye ku di hemu deman da zagonên îtalyayê berçav bigiri. Eger di mijara zagonî yan der zagonî buna her mijarekê eger gumana te hebu, bîlez **daxwaza alikariyên ji parêzerekê bike.**



## LÎ SER VAN MÎJARÊN LÎ JÊR BALDAR BE:

- Eger ku tu bi sizayekê giran hatiye darezandin (Wek minak sizayê tundiye yan gefa diji rayedareki neteweyi, ziyangihandina li keseki, dizi yan diziya çekdari, dizina berhemê droki yan firotina narkotikê, tundiya zayendi, derbazkirina Mirovan bi awayê veşarti);

Yan

- Eger ji ber sizayekê giran di bin darizandina sezayê da yî' û li nav girtigehê jibo veğerandina bo welatê xwe da dimini;

Di her du rewşan da, pêvajoya diyarkiri ji aliyê zagonê ve yeke pewist dike ku tu ji aliye Komisyona Navçeyi va jibo hevpeyvîneke **Bilez** weri xwestin. Di rewşeka wiha da eger daxwaznameya te jibo wergirtina Piştewaniya Navneteweyi were redkirin, zagon bi aşkirayi dibêje ku divê axa İtalyaye biterikini, heta eger tékildari vê biryarê daxwaza venêrinê bidi.

## Mafên min wek daxwazker çine?

**BALDARBE:** Rêveberiya Polis ku daxwaznameya te ya jibo Piştewaniya Navneteweyi werdigire, maf û erkên te, her wiha tevahiya qonaxên vê pevajojê de ji te ra ragihîne. Tu dikari zanyariyên bêhtir ji pisporeki mafzan li navenda wergirtina daxwaznameya yan ji civatên herêmi û xwecihi yên piştewaniya ji daxwaziyan penaberiyê biki. Di dirêjahiya vê qonaxê da tu hertim dikari digel Komisarya Bilind ya penaberan ya Netewayên Yekbuyi , Ajansa Penaberan ya NY bikevi tekiliyê.

Di dawiya vê rahehanderê da çend hêjmaren telefona yên sudmend hatine raberkirin.

**LI İTALYA BIMİNE:** Bi gişti wek penaberek tu dikari bi awayê zagonî heta dema biryardana tekuz derbarê daxwaznameya wergirtina Piştewaniyê da, li İtalya bimini.

---

1 Ji pisporeki mafzan daxwaza agahiyên bêhtir tekildari sizayên navbiri bike.

*Di hin mijaran da dine ku te mafê mayina li italyayê tunebe. Jibo wergirtina agahiyên bêhtir seri li beşa "Gelo ez dikarim H biryara Komisyona Navçeyi daxwaza venêrinê raber bikim?" di rupela 30 da û beşa Gelo ez dikarim daxwaznameyeka nu jibo wergirtina Piştevaniya Navnetewî raber bikim?" di rupela 31 da bide. Ji pisporek mafzan agahiyên bêhtir daxwaz bike.*

**WERGIRTINA BELGEYAN: Jibo te Destura mayinê bo daxwaza Penabertiyê,** dê were dayîn ku wek belgeyeka naskirinê weke bawername yê û vê desturê dide te ku **di welatê Italya da bimini.** Ev destur heta dema biryardana derbarê daxwaznameya te ya piştevaniye derbazdare.

*Ji parêzerekê agahiyên bêhtir daxwaz bike*

**LÊ MIQATEBONÊN TENDURUSTIYÊ:** Mafe te heye ku lê miqatebunên tendurustiyê bi awayî werbigiri.

**XWENDIN:** Te mafê navnîvîsina li dibistanekê heye.

**KAR:** Du mehan piştî raberkirina daxwaznameya wergirtina Piştevaniya Navnetewî li reveberiya Polis, tu dikarî heta dema bidawî hatina ve pevajo yê **kar biki.**

*Destura mayinê jibo daxwaznameya Penabertiyê nikarî bikî Destura Mayina jibo kar û ev destur mafê teviibuna endamên malbatê nade te.*

**WERGIRTIN:** Eger te hina desturnameyek jibo debara jiyane tune ye, te mafê wergirtinê li **navendeke** penaberan heye.

# 4. WERGIRTIN

## Dema min çavkaniyên pêwîst nebe jibo wergirtina desturnamyê, gelo kî dikare alikariya min bike?

Kengê tu hati nav welatê Îtalya, wê te bibin navendeke **Alikariyên seretayî û alikariyandinê** ku li wir alikariyên destpêkê û zanyariyan werbigiri.

Piştî weya ku tu ji aliyê rayedarên Polls va hati naskirin, eger ku te dixwazi xwe serî li daxwaznameya piştgiriye bide û çavkaniyên kesi yê te têra bicibun û timarê neke, tu yê bo **navendeke wergirtina penaberan**, weri veguhestin ku dikari di tevahiya heyama pevajo ya tederxistinê jibo wergirtina Piştewaniya Navnetewî (her wiha di dema her cure daxwaza venêrinê ji dadgehê li dji biryara Komisyona Navçeyî va) li wir bimini.

Eger ku tu kesekî bi tenê û dibin temenê zagonî de yî, mafê te heye ku tenê li navendeke taybetî bi kesên bin temenê zagonî de bimini. Eger te belgeyek tune ye ku biselîmîni tu dibin temenê zagonî de yî, ji xebatkarên navenda ku li wir dimini, agahiyên zedetir bixwaze.

# Maf û erkên min li navenda wergirtinê çine?

**Zagon û rezikên navendê** erk û mafên te di dema mayinê da diyar dike.

**Te ev** maf hene ku:

- A. Mafê mayinê.** Cihên mayinê yên cuda jibo mêran û jinan hatine amadekirin; Eger endamên malbatê ji digel te ne, te ev maf heye ku li cem wan bimini;
- B. Tîmar û xwarek,** li gori pêwistiyên te;
- C. Cil û** pêwistiyên kesi yên paqijiyê;
- D. Alikariyeke pereyi jibo** pêwisti û xercên rojane;
- E. Alikariyên bijîşki û dermani;**
- F. Alikariya derunnasi û civaki;**
- G. Agahi derbare** zagonên italya;
- H. Pewendidare Ziman u çandê**

**Li vê navendê te mafê hevditina digel nunerên Komisaryaya Bilind a Penaberan a NY, parêzerê xwe û her yek ji endamên malbata xwe heye.**

Rexistinên piştevaniya ji penaberan û piştevaniya ji kesên ku daxwaza desture kirine yan ew wergirtine ji dikarin têkevin navenda wergirtinê.

**Eger te her cure pêwistiyek taybet hebu, dikari ji kedkaren navendê ra bibêji û ji wan daxwaza alikariyê biki.** Wek minak, eger tu ducani yi, kêşeyen te fizîkî an deruni hene, an buyi qurbanî zayendî, yan cinsi.

Jibo ku berpîrs bikarin bi baştirin awayi pêwistiyên te fam bikin, ji vey ku heta tecrube û serpehatiyên xwe yên heri dijwar û diltezin ji wan ra bibêji, netirse, ji ber ku ewna neçar in ku sîrr u nihêniyan biparezin û nabe ku bêyi razibuna te agahiyên ji kesekî ra parve bikin.

Di dema mayina di vê navendê da **tu erkdari ku**:

**A.** Hertim **liv û tevgera bi rêzdari** derbarê mêvan û xebatkarên navenda wergirtinê de pêk binî.

**B.** Hertim **yasa û rêzikan berçav bigire.**

Her cure binpêkirina rêzik û zagona dibe ku bibe sedemê derxistina te ji navendê. Ji kesên berpîrs daxwaza agahiyên bêhtir bike.

## Gelo ez dikarim ji navenda Wergirtinê derkevim?

Li navenda wergirtinê hinek zagon û rêzîkên taybet hene, ji wan yek ji berçavgirtina demê ye. Di dema rojê da dikari di demên diyarkiri da ji navendê derkevi. Di rewşa awarte da ku te pêwîstî heye bo demekê direjtir li derveyî navendê bi, dikari daxwaza xwe jibo wergirtina desturê raber biki: Jibo wergirtina agahiyên bêhtir bi berpîrsan ra bi axive.

Eger bêyî destur ji navendê derkevi yan şev neziviri navendê, renga **mafê xwe yê mayina li navendê winda biki**.

## 5. NIRXANDINA DAXWAZNAMEYÊ Û ENCAMÊN WÊ:

Piştî raberkirina daxwaznameya wergirtina Piştevaniya Navnetewî, jibo hevpeyvîna li gel Komîsyona Navçeyî ku erka wê nirxandin û lêkolînkirina daxwaznameyên bi vi rengi ye, tu yê weri vexwendin.

Di dema çaverêkirinê de dibe ku çend hefteyan heta çend mehan be. Vê demê jibo amadekirina xwe jibo hevpeyvînê û **komkirina belgeyan** pêwîste bi kar bine, tu dikari vi kari bi alikariya berpîrsên navenda wergirtinê yan her civateke din ku dixwazi jê alikariyê werbigiri, pêk bini. Tu dikari hemu belgeyên ku baweri jibo nirxandina daxwaznameya te sudmendin, raberi komîsyona navçeyî biki.

**Eger tu bi tenê yan dibin temenê zagonî da yi**, yan te pêwîstiyên taybet hene, dibe ku yekemîntî jibo daxwaznameya te were raberkirin.

Tu her demekê dikari daxwaznameya xwe jibo wergirtina Piştevaniya Navnetewî betal biki. Jibo haydariya ji çawaniya vi kari, ji pisporeki mafzan daxwaza zanyariyan bike.

### Di hevpeyvînê da ci pêktê?

Ji aliyê yek ji xebatkarên komîsyona navçeyî va hevpeyvîn ji te tê kirin. Li gori vey a ku tu çawa aramî, dikari daxwaz biki ku ji aliyê jinek yan mêreki va ji te hevpeyvîn were kirin û eger pêkan be, dê ev rewş jibo te were amadekirin.

Eger jibo te giringe dikari daxwaz biki ku hevpeyvîna digel te ji aliyê desteya komîsyona navçeyî yan ji aliyê dadwerê çavdêr ve were kirin.

Bi amadebuna wergerekîzimanê te bixwe, **dê hevpeyvîn li te were kirin**. Eger tegihîştina mijarê jibo te zore yan jiber hin sedeman hebuna werger dibe sebaba nerihetiya te, ji kerema xwe ve mijarê ji xebatkarên fêr bibe.



**Werger keseki peşeyi u beali ye** ku bi awayeki deqîq pirsu bersivan werdigerine. Wan tekildari **parastina sîrr u niheniyân** sond xwarine u tu roleke wan di nîrxandina dosyeya te da tuneze.

**Hevpeyvîn bi awaye kesane pek te.** Heta eger hevjin an endamen din en malbata te di heman roze da jibo hevpeyvîne hatibin xwestin, hevpeyvîna ji her yek ji we bi awayeki cida pek te. Eger temene te di bin 18 salî da ye u hevre digel dayik u bave xwe yî, Komîsyona Navqeyî biryare dide ku gelo civîna hilkolandina rewqâ te pek bine an na. Eger ewna biryare bidin ku jibo te civîna hilkolandine pek binin, bi amadebuna debavan digel te hevpeyvîne pek tinin.

**Eger temene te bin 18 salî u hevre digel debave xwe nîni, bi amadebun asergere te de digel te hevpeyvîn pek were** (Seri li rupela 16 bide).

Tu dikari ji **parezereki** bawerpekiri alikariye werbigiri (Ji kerema xwe baldar be ku di direjahiya ve qonaxe da tu ye alikariyen mafdarî yen belâş wernegiri).

Eger her cure hewcetiyeke te ya taybet heye, dikari beriya hevpeyvîne **daxwaza hebuna karzane piştewaniye raber biki** (wek alikarigihaneki civakî an derunnase ku te derman dike).

Bi mebesta ronbuna zedetir, hevpeyvîn bi awaye weneyî (vidyo) te qeydkirin, meger ku keşeyeka teknîkî di vî warî da hebe. Eger ku naxwazî filma te be qeydkirin, dive hegeren xwe raber biki. Komîsyona navqeyî tekildari daxwaza te biryare dide.

Her tijte ku di hevpeyvîne da te gotin, di belgeyek bi nave **"Destura Civîna Bihistine" da te nivisandin.** Ev belge di dawîya hevpeyvîne da careke din **de jibo te** were xwendin. Eger babeteka nedurust hebe an eger bixwazî tijteki ron biki, dikari bixwazî ku ev destur were sererastkirin. Eger filma hevpeyvîne **hatibe kîşandin,** cihenera hevpeyvîne u werger belgeya tekildari wajo dikin u tene di rewşeke da ku te babeteke taybet di belgeye da diyar kirine, ji te te xwestin ku we wajo biki. Eger filma hevpeyvîne nehatibe kîjandin, ji te de were xwestin ku destura civîne hevre digel werger u cihenera hevpeyvîne wajo biki.

Pijti xwendina dubare ya destura civîne, **versiyonek** de raberî te were kirin. Tu tene dikari biryare bîdî ku gelo kesek dikare we belgeye bixwîne an na u kesen repedayî bo xwendina we de qî kes bin (wek minak parezere te).

Komîsyona Navqeyî li gorî qanun u rezîken parastina sîrr u biheaniyan dixebitin u hîq wext hîq agahî u zanyariyeke nihenî u qexsî beyî razibuna te digel kesen derveyî ve pevajoze de parve nekin (wek minak: Rayedaren welate te, malbata te an navenda ku li wir dimînî). Loma tu hertim dikari bi awayeki **serbest** gotinen xwe bibejî.



## Van pirsan ji min bike?

Cihê hevpeyvînê alikariya te dike ku çiroka xwe jinûve ava biki. Eva giringe ku rastiyê bibe ji **û hevkarîyê biki**. Eger tiştek nayê bira te, yan tiştekê dizani ku ji te pirs nehatiye kirin, we ragihine û eger te pirsek fam nekir, daxwaz bike ku bo te ron bikin.

Di dema hevpeyvînê da di ware agahiyên jêre dê pirs ji te were kirin:

- **Nasnameya te** (resentî, malbat, çand, asta xwendine, kar û dibe mezheb û baweriyên siyasi);
- **Sedema kû te terka welatê xwe kiriye;**
- **Tirsên ku te derbarê vegeriyana jibo welatê xwe hene û** xeterên ku di vi wari hene.

## Gelo derfet heye ku bêy li gel min hevpeyvîn were kirin, derbarê dosyaya min de biryar were dayîn?

Di şert û mercên jêre da dibe tiştek wiha biqewime

1. Eger Komîsyona navçeyî bêje ku di dema niha da hemu hêmayen pêwîst jibo raberkirina Rewşa Penabertiyê li ber destê te hene;
2. Eger di rewşa ku hevpeyvîna digel te pêgan be, lê tu amade nebî (Di rewşek wiha da tu divê mijarê ji Komîsyona Navçeyî ra bibêji û belgeyên bijîşkî yên daxwazkiri raber biki);
3. Eger ne gehijîn te û di encam da agehdarkirina te jibo amadebunê pêgan nebe. Di vê rewşê da, dê dosyeya te were redkirin. Tu dikari Komîsyonê haydar biki û nebuna xwe bi hincet nişan bida, di vê rewşê da dibe ku jinuve weri xwestin.
4. Eger bêyî raberkirina delil û egeran bo Komîsyonê, jibo hevpeyvîna Komîsyonê amade nebi. Biryardana li ser dosyeya te, dê li gori belge û şehadiyên heyî pêk were.

*Jibo wergirtina zanyariyên bêhtir di gel pisporeki zagonê bikeve têkilliyê.*

# Encamên hêvî kiri yên daxwaznameya min jibo wergirtina piştgiriya Navnetewî çî ne?

Dosyeya te ji aliyê desteyeka 4 kesî ya pêkhati ji serokê Komisyone, kesek diyarkiri ji aliyê Komisyeraya Bilind ya Penaberan ya NY, du xebatkarên Wezareta karên hundir (ku yek ji wan cihan hevpeyivîna ye) dê were lêkolînkirin û nirxandin. Encamên hêvîkiri yên jêre dibe ku werin bi destxistin:



Tê derxistina Rewşa Penabertiyê



Tê derxistina Piştgiriya



Tekmili Piştewaniya



Taybet Red kirina daxwaznameyê.

# Di çî rewçekê da ez dikarim wek penaber werim naskirin?

Li gori Konvansiyona Cinêvê ya sala 1951'ê, eger li gori egerên jêre **tirseke bi pêwîst derbarê êşên ku te li welatê xwe yê sereke da jiyana kiri, tu yê wek penaber weri naskirin:**

- **Nîjad** (Wek minak, jiber k utu endamê nijadeke taybet bi);
- **Mezheb** (Wek minak, ji ber şopandin yan ne şopandina mezheb yan dad û nerîdan);
- **Netewe** (Wek minak jiber ziman, çand, kokê nijad û regezê);
- **Baweriyên siyasi** (wek minak jiber endambuna li komeke siyasi yan ji ber fikrên siyasi);
- **Ser bi komeke taybet ya civaki bûn**, yani komeke mirovan ku jiber

hebuna taybetmendiyên hevpar tên naskirin, yan kesên ku civaka wan jiber taybetmendiyên navbiri, wek komeke ciyawaz dizane (wek minak di hinek welatan da, hinek nêrinên zayendi yan kar yan desturnameyekê taybet ya jiyane)

### **û eger nekari ji aliyê welatê xwe yê sereke ve weri piştgirikirin.**

Eger te mafê welatibunê tune ye, yan eger ku tu welatîyê welateki nini, welatê ku te berçavgirtin, welatekê ku bi awayê normal tu tê de dijî.

Hinek minak hene: Hebuna gefan liser jiyana te, işkence, koledari, bêparbuna ji azadiya kesane, sinetkirina jinan yan bînpêkirina mafên bingehîn yê mirovan yan mirjarên din yê bînpêkirina ciddî yan berdewam ya mafên te.

## **Ez di kîjan rewşa da dikarim piştewaniya temam bi dest bixim?**

Eger neyê piştastkirin ku te zextên pêwîst jibo hebuna Rewşa Penabertiyê hene, de piştgiriyê raberi te were kirin, helbet **"egerên Bi belge"** hebin ku li gori wan ev baweri pêk were ku eger tu vejeri welatê xwe, dibe ku bikevi ber **xetera ziyana giran** (Darizandin, darvekirin, işkence, liv û tevgerên ne mirovane yan heqaret, xetera mirinê jiber hebuna pevçûnên çekdari di welatê te da) û te derfeta bîdestxistina piştewaniya welatê xwe yê sereke ji tunebe. Di vê rewşê da ji, eger te mafê welatibunê tune be, yan eger tu welatîyê welateki nebi, welatê ku te berçavgirtin, welatek yê ku tu bi awayê normal li wir jiyayî.

## **Di kîjan rewşê da ez dikarim piştewaniya Taybet bi dest bixim?**

Di rewşeka taybet da ku raberkirina Piştewaniya Navnetewî jibo te neyê piştastkirin, lê xetera ketina ber darezandin, işkence yan cureyên din yê refarên ne mirovane yan heqaret li welatê te yê sereke hebe, dê piştewaniya taybet bo te were raberkirin.

# Di kîjan rewşê da dibe ku Komisiyona Navçeyi daxwaznameya min red bike?

Eger pişti nirxandina hemu mijaran de, ev komisiyon li ser vê bawerbe ku jibo raberkirina her cure piştgiyeyeke jibo te, **egerek taybet tune**ye, daxwaza te dê were redkirin.

Di hinek mirjarên taybet da, dibe ku daxwaza te jiber ku **çaverêtiya bêbingehe, were redkirin**. Dibe ku ev redkirina daxwazê di van rewşan da pêkwere: Eger komisiyona navçeyi bibawer be ku mijarên ku te di hevpeyvîna xwe da qala wan kir, tu têkiliyek bi Piştewaniya Navnetewî tune; Eger ku welatê ku tu jê hatiji aliyê rayedarên italyayî ve, welateki bi ewleh bê zanin û pişti lêkolînkirina qonaxên penabertiyê, ev komisiyon bibawer be ku li gori rewşa te ya kesî, egerên di cih jibo ne ewlehiya welatê navbiri jibo vegerandina te bo vî welatî tunene, eger te belge û şahidiyên derew raber kiribin û hinek delilên reftara xwe rave nekiribe yan eger ku te ne hêlabe ku şopa tiliyên te were girtin.



## Li ser van mijaran balder be:

Eger daxwaznameya te ji ber "Aşkîra bê bingehbunê" hatibe redkirin, **dema ku** dikari daxwaza xwe ya venêrînê raberî dadwer biki, tenê 15 roj e, (Jibo wergirtina agahiyên bêhtir derbarê daxwaza venêrînê jibo biryara ji aliyê Komisiyona navaçeyi va hatî dayîn, serî li rupela 30 bide). Di rewşên wiha da, jibo ku bikari di dema ku daxwaza te ya venêrînê tê lêkolînkirin, amadebuna xwe li welatê îtalya bidomine, parezerê te divê jibo vê mayinê li axa îtalyayê daxwaza destura taybet ji dadwer bike.

*Jibo wergirtina agahiyên bêhtir derbarê hemu rewşên ku di dema wan da daxwaznameya te "Aşkîra bê bingeh" tê zanin, her wiha jibo agehdarbuna ji duhatên wê, ji pisporen mafzan bixwaze ku agahiyên bêhtir radestî te bikin.*

## Ezê çawa ji biryara di derbarê min de hatî dayîn agehdar bibim?

Encama daxwaza te jibo wergirtina Piştevaniya Navnetewî li hundire **Daxuyaniyekê te dama ku ji aliyê Komisyona navçeyi va tê amadekirin û ravekirin**. Tu yê **bi rêya** pisporekê amade **li navenda ku** tê de dimînî, ji vê biryarê agehdar bibi yan bi rêya posteya daxuyaniyê **li mala xwe** wê yekê werbigiri, helbet eger te navnişana cihê mayina xwe ji polis re ragehangî be (serî li rupela 12 bide).

Lewra giringe ku her dema navnişana xwe diguherîni, mijarê ragihine polîs û Komisyona navçeyi û her wiha ragihîni ku li navenda wergirtinê li benda wergirtina agahiyên têkildari biryara hati dayîn ji aliyê ve komisyone va yan di navnişana ku te raber kiriye. Eger tu vi kari neki, **tu yê daxuyaniya** ku tê de biryara hatî dayîn derbarê daxwaznameya bi destxistina piştevaniyê heye, wernegiri.



### Baldarî

Eger ji ber amadenebuna te li navenda wergirtinê yan navnişana raberkirî, daxuyaniya têkildari wernegirtin bin tu dikari vê agahiyê ji navenda polîs bistinî. Ev daxuyani bi qasi bist rojan piştî girtina wê, dê li navenda polîs li ber dest be.

Piştî roja bistem, ev daxuyani wek radestkirî tê zanin û rayedarên berpîrsên Îtalya, dê naveroka wê bi cih binin:

- Mafê te yê mayina li welatê Îtalyayê yan pêwîstiya te bo derketina ji Îtalya gîredayi bi naveroka vê daxuyaniyê ye;
- Dema raberkirina daxwaza venênînê li ser biryara dayî dê ji aliyê Komisyona Navçeyi va were destpêkirina (serî li Paragrafa jêr bide)

Kengê bixwazi, dikari ji Komisyonê daxwaz biki ku kopyayek ji vê daxuyaniyê bidin te.

# Gelo ez dikarim derbarê biryara ji aliyê Komisyonê ve hatî dayîn de daxwaza venêrînê bikim?

Eger tu li ser biryara ji aliyê Komisyonê de hati dayîn bixwazi ku daxwaza dadweriyê bikî, bi alikariya **parêzereki** vê biryarê jinuve lêkolîn bike. Ji kerema xwe baldar be ku **dema daxwaza jinûve venêrînê (30 an 15 rojan**, li gori dosyeya di rewşa lêkolînê da), di dawiya nivisa biryarê dehatiye nivisandin.

Eger derget û demê te jibo vê mebestê tune, te ev maf heye ku **alîkariya parêzerekê** bi dest bixî.

Daxwaza jinûve destgirtina biryarekê, bi giştî vî mafî dide te ku heta dema ku dadgeh biryara xwe bide, **Li welatê îtalya** bimini. Tevî vê yekê di hin mijaran da jibo ku bikari li îtalyayê bimini, parêzerê te divê daxwazeka taybet bide dadwerê berpîrsê biryardane derbare dosyeya te (wek minak, eger tu li "Girtigehka tayebe ya vegeandina kesan bo welatê xwe" da têyi ragirtin, yan di rewşa ku hatiye ragihandin ku daxwaza te "Aşkîra Bê bingeh" e).

Jibo wergirtina agahiyên bêhtir, ji pisporeki amade li navenda xwe ya mayînê yan ji civateke taybet a piştevaniya ji penaberan yan ji parêzerê xwe daxwaza alîkariye bike.



## Li Ser Van Mijara Baldar Be:

Heya eger te derbarê biryara ji aliye Komisyonê ve hatî dayîn, daxwaza jinnûve destgirtinê kiribe, li gori zagonê du rewş hene ku li gori wan, te yê destura mayîna li axa îtalyayê tunebe:

- A) A) Eger piştî raberkirina daxwaznameyê jibo wergirtina piştevaniyê û wergirtina bersiva nerênî di vi wari da, te egerên nu hebin ku bi baweri li gori wan te pêwîstî bi Piştevaniya Navnetewî heye û daxwaznameyeke nu raber bike, lê ev komisyon li ser vê bawere bê ku mijarên nu tekildari rewşa te ya kesî li welatê te yê sereke tunene û ragihine ku daxwaznameya te nayê qebulkirin (seri li paragrafa din ya bi navê "Daxwaznameya dubare" bide);
- B) B) Eger ku daxwaznameya te ya jibo wergirtina Piştevaniya Navnetewî ji rîya pêvajoyeke lezgin hatibe nixandî û redkirin (seri li rupela 18 bide).

*Jibo wergirtina agahiyên bêhtir derbarê hemu şert û mercên ku ii gori wan tu neçarî axa îtalya biterikini, di gel parêzerê xwe bikeve têkilliyê.*

# Gelo ez dikarim daxwaznameyeka nû jibo wergirtina Piştevanîya Navnetewî raber bikim?

Tu di rewşên jêr da dikari **daxwaznameyeka nû** raber biki:

- Eger te daxwaznameya xwe ya berê betal kiribe;
- Eger ku biryara ji aliye Komîsyonê ve hatî dayîn tekildari daxwaznameya ku te berê raber kiriyê, nerênî be, yanî eger ku ev biryar êdî jinuve nekare ji aliyê dadwerekî were lêkolînkirin.

Daxwaznameya nû, wek "**Daxwaznameya dubare**"tê binavkirin

Komîsyon tenê di rewşekê da Daxwaznameya dubare lêkolîn dike ku **mijarên Nû** jibo hilkolandina biryardana derbarê pêsiya te bo wergirtina Piştevanîya Navnetewî hebin (Wek minak: Eger guhertinek di rewşa welatê te yê sereke yan jiyana te de pêk hatibe yan di rewşa ku te belge û şehadiyên nû jibo raberkirinê hebin). Eger ku mijarên nû tunebin, daxwaznameya te dê neyê hilkoalndin û nixandî û di encamê da dê wek **Nayê Qebulkirin**.were ragihandin.



## **Li Ser Van Mijara Baldar Be:**

Eger di dema ku welatê Îtalya bi cih dihêlî, daxwaznameyeka dubare raber biki (bi taybet eger ku li navendeka taybetî vegerandina bo welatê xwe yê sereke da yi), li gori zagona Îtalya tu xwe bi xwe wek kesê ku Nayê Pejirandin weri hesabandin û dosyeya te dê neyê hilkolandin.

Ji ber vê yekê ev gelek girîng e ku eger mijarên nû û berbiçav derbarê pêwîstiya te bo wergirtina Piştevanîya Navnetewî pêk hatine, herî zutir daxwaznameya xwe ya dubare raber bike.

# Kîjan pêvajo lezgînin?

Di her yek ji rewşên jêr da, daxwaznameya te dine ku di pevajoçekê lezgintir da were hilkolandin:

1. Eger ku te piştî hewildana jibo hatina nav welat bêyi amadebuna li navenda Kontrola Polîs, **Daxwaznameya** xwe jibo wergirtina Piştewaniya Navnetewî **bi awayê rasterast li ser Sînor**, raber kiribe;
2. Eger bi mebesta diyarkirina pênasayê yan selimandina welatibuna xwe di navendekê taybet da tê yî ragirtin.
3. Eger aşkira buye ku daxwaznameya te " **Bê bingeş**"e. (wek minak: Eger komisiyon bibawer be ku mijarên ku te di hevpeyvîna xwe da qala wan kir, tu tîkiliyek bi Piştewaniya Navnetewî tune; Eger ku welatê ku tu jê hati, ji aliye rayedarên italî ve, welateki bi ewleh bê zanin û piştî lêkolînkirina qonaxên penabertiyê, ev komisiyon bibawer be ku li gori rewşa te ya kesane, egerên di cih de jibo ne ewlebuna welatê navbiri jibo veşerandina te bo vî welatî tune be, eger te belge û şehadiyên derew raber kiribin û te hinek delilên reftara xwe rave nekiribe yan eger ku te nehêlabe ku şopa tiliyên te were girtin). Serî li Paragrafa bi navê "Di çi rewşekê da ev Komisiyon dê daxwaznameya min red bike?" di rûpela 28 da bide.

Eger ku tu di Pevajoya Lezgin da yi û pêwîste ku çend rojan zutir dem bo te were terxankirin da ku belge û şehadiyan yan hin mijaran bi dest bixi ku dê alikariya te jibo piştewaniya ji daxwaznameya wergirtina Piştewaniya Navnetewî bike, bîlez mijarê ji pisporeki zagonî yan Komisiyonê re ragihîne



# 6. MAF Û ERKÊN PIŞTI PIŞTRASTKIRINA WÊRGIRTINA PIŞTGIRIYÊ

## Wek kesek xwedi berjewendi yan Xudan piştgiriya navnetewî mafên min çi ne?

### RADESTKIRINA BELGE Û ŞEHADIYAN:

1. Jibo ku bikari bi awayeki zagonî li welatê îtalya biminî: **Destura Mayinê ya jibo 5 salan**, ku dikare were direjkirin;
2. Jibo ku bikari biçî derveyi welatê îtalya: **Belgeyên Geştê** (eger ku tu penaberek bi) yan **Destura Geştê** (dema ku te mafê runiştinê girtibe û egerên bi belge derbarê veya ku nekari jibo wergirtina pasportê seri li rayedarên diplomatik yan welatê xwe yê sereke bidî, tunebin).

Bi karanîna van belge û şehadiyan, tu dikari bi awayê zagonî û bêyi pêwistiya bi daxwaza Vîzayê, biçe yek ji 26 welatên endamê Yekitiya Ewropayê li **herêma Şengenê (Schengen area)**, û heta **3 mehan** li wir bimini (Tevi veya tu nikari li wir bixebiti yan bi awayê berdewam li wir bimini).

Piştî raberkirina daxwaznameyê jibo wergirtina Piştevaniya Navnetewî û eger ku pewistiyên din hatin dabinkirin (Ji wan hebuna debarê û nebuna tawanên sizayî), tu dikari jibo wergirtina **destureke mayina demdirej li Yekitiya Ewropayê** daxwaza xwe bidi. Bi vê desturê tu dikari bi awayê zagonî û li gori rêzik û zagonên welatê ku dixwazi li wir bimini, derbasi welateki din yê endamê Yekitiya Ewropayê bibi û bo demekê zedetir ji 3 mehan, wek karker, xwendevan yan bo mebestên din, li wir bimini.

**KAR:** Tu dikari li gori rewşa heyi jibo welatên Yekitiya Ewropayê, Bazara Kar ji wan karkirina li Beşa dewleti bi kar bini;

**NAVNIVÎSIN:** Tu dikari wek rewşa heyi jibo welatên din yê biyanî li şaredariya cihê ku lê dimini, navê xwe tomar biki;

**XWENDIN, XIZMETÊN CIVAKI Û LÊQEWMANÊN TENDURUSTIYÊ:** Te ev maf heye ku di van waran da heman xizmetan bi dest bixi ku welatîyên dinyêen îtalyayê wan bi kar tinin;

**MAL:** Tu dikari jibo bikaranina malên rêxistinî daxwazê biki;

**TEVLIBUNA LI MALBATÊ:** Tu dikari bêyi pêwistiya bi selimandina hebuna dahat yan malê, tevli xizm û kesên xwe bibi (Dikari tevli kesen mina hevjinê/a xwe, zarokên dibin temenê zagonî, dê û bavê xwe ku zedetir ji 65 sal ku zarokên din tunene bibi; Jibo wergirtina agahiyên bêhtir derbarê xizm û kesên ku dikarin li te zêde bibin, dikari ji pisporek mafzan bixwazi ku agahiyên di vi wari da bidine te);

**MAFÊ WELATIBÛNE:** Eger rewşa te ya penabertiyê heye, piştî 5 salan û eger xudanê Piştewaniya Temamkiri yi, dikari piştî 10 salan mayina li welatê îtalyayê, jibo wergirtina mafê welatibuna îtalyayê daxwazê biki.

## Eger min Piştewaniya Taybet hebe, yê çawa bibe?

Te ev maf hene ku:

**DAYINA BELGE Û ŞEHADIYAN:** destura mayina 1 sali, eger ku hema wisa pêwistiya te bi wergirtina piştewaniyê be, ev destura mayinê dê bikare were dirêjkirin.

**Tu dikari jibo wergirtina destura ger û geştê ya taybeti welatîyên biyani daxwaza xwe biki,** helbet eger nikari ji rayedarên diplomatik yê welatê xwe yê sereke daxwazê biki ku pasportê bidin te.

**KARKIRIN:** Tu dikari bi awayê zagonî kar biki, lê nikari destura mayinê ya Piştewaniya Taybet bo Destura Mayina Kar biguherini.

**NAVNIVÎSIN** Tu dikari li şaredariya cihê mayina xwe, navê xwe tomar biki.

**XIZMETÊN CIVAKI Û LÊQEWMANÊN TENDURUSTIYÊ.**

## Erk û mafên min çi ne?

### DIVÊ HERTIM HAYA TE JI ZAGON Û RÊZIKÊN WELATÊ ITALYA HEBE

Eger hat û zagonên welatê îtalyayê binpê biki, dosyeya te bi armanca betalkirina Piştevaniya Navnetewî, dê jinûve were nixandin (*serî ii Paragrafa bi navê "Rawestandî û Betalkirina Piştevaniya Navneteweyî" di rûpela 36 da bide*).

## Gelo ez dikarim vegerim welatê xwe yê sereke?

Eger te rewşa penabertiyê hebe û ji rayedarên berpirs yên welatê xwe yê sereke daxwaza pasportê biki,

Yan

eger xudanê rewşa Penabertiyê yan Piştevaniya Temamkiri bi û heta bo demekê kurt, vegeirî welatê xwe yê sereke,

divê haya te ji vê yekê hebe ku liv û tevgerên te dibe ku bibin sedemek jibo rawestandina Piştevaniya Navneteweyî (*serî li Paragrafa têkildari Rawestandina Piştevaniya Navneteweyî di rûpeya 36 da bide*).

**Eger ku biryarê bidî bi awayê hertim vegeirî welatê xwe yê sereke** û eger ku te şert û mercên pêwîst jibo vê yekê hebin, dikari bejdari bernamêyên **"Alikariya bo vegeiriyana dilxwazi û Sazbuna Civaki ya Dubare (VARR)"** bibi. Ev bernamê ger û vegeirî te organize dikin, xerc û mesrefên te heta giştîna bo xala dawiyê didin û alikariyekê biçûk ya aborî ji radestî te dikin.

*Jibo wergerîna agahiyên bêhtir derbarê, bi rêya hêjmara telefona bêpere ya 800 2000 71, digel "Rexistina Navneteweyî ya Koçberiyê" bikeve têkiliyê*

# Rawestandin û Betalkirina Piştewaniya Navneteweyi

- Eger şert û mercên ku li gori wan Piştewaniya Navneteweyi raberi keseki hatiye kirin, êdî tunebe (wek minak, eger rewş li welatê te yê sereke bi awayeki mayinde hatiye guhertin; bi awayeki ku êdî xeter li ser te tunebe, yan eger tu bi awayeki dilxwazi û xwebexş vegeyriyabi welatê xwe yê sereke), dibe ku ev Piştewaniya Navneteweyi êdî were **rawestandin**.
- Eger were diyarkirin ku Piştewaniya Navneteweyi li ser bingihê agahiyên ne rast yan belge û şehadiyên nerast hatiye raberkirin yan eger derkeve holê ku te sizayên diji mirovahiyê, diji aştî yan sizayên cengî pêk anine yan eger bi awayeki tekuz ji ber hin sizayênn taybet û giran hatibuyî dazewandin (wek minak weke diji rayedareki dewletê, pêkanina ziyanên berçav yê bedenî, dizîn, diziya berhemên dîrokî yan firotina madeyen hişber, tundiya zayendi, qaçaxa mirovan), yan eger gefeke li diji ewlehiya welatê îtalyayê pêk bini, renga ku Piştewaniya Navneteweyi ya raberkiri bo te **were betalkirin**.

Di vê rewşê da dibe ku Komisiyon mafên Penaberan dosyeya te jinûve binirxine û biryara betalkirin yan rawestandina Piştewaniya Navneteweyi y ate bide.

*Jibo wergirtina agahiyên bêhtir, ji kerema xwe digel pisporeki mafzan li navenda xwe yan civateke xwecihî ya taybeti piştewaniya ji penaberan bikeve têkiliyê.*

# 7. DESTURÊN DINYÊN MAYINÊ

Eger tu baweri ku te şert û mercên pewist jibo raberkirina daxwazê jibo wergirtina Piştevaniya Navneteweyî tuneye, di hin mijaran da dikari li **navenda Polîs** jibo wergirtina cureyên din yê desturên mayinê daxwaza xwe bidi:

**1. DESTUR JIBO DERMAMBUNÊ:** Eger **rewşa tendurustiya te xirap be** (Belgeya piştrastkirinê ya selmandina vê mijarê ji aliyê navendên lêqewminên tendurustiyê yê dewletî yan rêpêdayî) û bi awayekî bê ku eger bo welatê xwe weri vegerandin, dibe ku derbên giran li dijî tendurustî û saxlemiya te pêk bîn, jibo wergirtina destura mayinê bo na **dermanên bijîşki** daxwaze bidi. Ev destura Mayinê jibo dermana bi tenê li welatê Îtalyayê û bo dema demi ya pêwîst jibo dermanên, bawerpêkiri yê (dema herî zêde ya desturê **1 sal e**). Ev cureya Destura mayinê piştî derbasbuna dema wê, **dikare were dirêjkirin**, û bo vê mebestê divê belge û jêhediyan bijîşki ku pêwîst bo dewama dermanê diyar dike, raber biki. **Jinên Ducanî** ji ev maf hene ku bona dermana xwe bijîşkiyê daxwaza Destura Mayinê bidin. Ev cureya desturê heta ji mehan piştî ji dayikbuna zarok bawerpêkiri ye.

**2. DESTURA MAYINÊ JIBO KARESATE:** Eger ji ber karesatên wek erdhej yan lehiyê, nikari bêxeter biziviri welatê xwe yê sereke, te eve maf heye ku Destureka Mayinê ya **6 mehi** werbigiri ku tenê di welatê Îtalyayê da bawerpêkiri ye. **Ev cureya Destura Mayinê piştî derbasbuna dema wê, jibo 6 mehên din dikare were dirêjkirin**, helbet di rewşa ku **welatê te yê sereke hema wisa ji ber rewşa navbiri, ne ewleh û aloz be**. Ev destura Mayinê, destura kar kirinê ji dide te, lê **belê tu nikari vê desturê biki Destura Mayina Kari**.

### 3. DESTURA MAYINÊ JIBO MÎJARÊN TAYBET:

**a)** Egertu qurbanê **neşê bikaranîn** yan qurbanê **Koledariyê** bi, **te ev maf heye ku destureke mayinê bi 6 mehan, werbigiri** ev destur dikare bo saleke din (yan bo dema pewsit jibo karên mafdariyê yan rewşa kar kirina niha were dirêjkirin. Ev Destura Mayinê, mafê xwendin, navnivîsin jibo peydekirina kar, her wiha mafê bikaranîna xizmetên alîkar (Bikaranîna Navenda wergirtinê ya wergirtina rasti, bikaranîna alîkariyên derunnasi û civakî) dide te.

**b)** Eger ku tu qurbanê **Ne bikaranîna Navmali bi**, te ev maf heye ku **destureke mayinê** bi qasî **1 salî** werbigiri ku dikare bo Destura Mayina taybetî xwendin yan kar **were veguhertin**. Ev cureya destura mayinê, derfeta bi destxistina xizmetên alîkar

(Bi karanina navenda wergirtinê ya parasti, bi karanina alikariyên derunnasi û civaki) her wiha mafê xwendin û kar kirine dide te.

**c)** Eger ku tu **qurbanê xebitina neçari bi** te ev maf heye ku **desturekê mayinê** bi qasi 6 mehan jibo pêkanina kiryarên mafdariyê werbigiri. Ev destura Mayinê jibo 1 sal yan bêhtir dikare were direjkirin. Ev destur derfeta kar kirinê bo te dabin dike û **dikare bo Destura Mayina Kari were veguhertin.**

Ji bili vey, li gori peşniyara rayedarê berpirs û bi destura Wezareta karên hundir, dibe ku jibo kesên ku "**Kiryarên Berbiçav ji Hela şaristaniyetê va**" (wek minak kesên li ber xetera filitandinê, peş li karesateke girtinê, hin kiryar li ser xêra mirovahiyê pêk anine, nav û dengê welatê îtalyayê berz kirinê û hwd), pêk anine, Destureke Mayinê were dayinê. Qala nixê vê Destura Mayinê ya **2 sal e**, û **dikare were direjkirin**, û mafê xwendin û kar kirinê dide te û mirov dikare wê bike Destura Mayina Kar.

*Ji pisporek mafzan bixwaze ku agahiyên bêhtir derbarê pewistiyan û pêvajoya daxwaza cureyên Destura Mayinê bide ber destê te.*

# 8. NAVNÎŞAN Û HÊJMAREN PEYWENDIYÊ

## HEJMARA TELEFONEN AWARTE:



**Hejmara telefona 112 ku hejmara taybeti Rewşa Awarte ye**  
(Polîs, vemirandina agir, Ambulans)

**Hejmara telefona 118 ku hejmara telefona Rewşa Awarte  
di ware saxlemiyê de**

*Ev telefon belaşin û bi awayê 24 demjimêran bi şev û roj çalak in  
û xebatkarên çend zimani û pispor bersivê didin.*

## Komiseriya Bilind ya NY di warê Penaberan da (UNHCR), Ajansa Penaberan ya NY

Bi rêya Navnîşana: Via Leopardi 24, 00185 Rome

**Hejmara Telefona** +39 06 802121

**Malper:** <https://www.unhcr.it> | **E-Mail:** [itaro@unhcr.org](mailto:itaro@unhcr.org)

**Jibo wergirtina agahiyên bêhtir û haydariya ji  
demjimêrên xebata vê ajansê, ji kerema xwe seri li vê  
malperê bide:**

<https://www.unhcr.it/chi-siamo/contatti>

## IOM

## Rêxistina Navneteweyi ya Koçberiyê

Di beşa taybet ya bernameya "Alikariya bo zivîrîna Dilxwazî û  
Sazbuna Cîvakî ya Dubare"

bi rêya Navnîşana: Via Nomentana 201, 00161 Rome

**Telefon.** +39 06 4416091 **Hejmara telefona Belaş:** 800 2000 71

**Malper:** <http://www.italy.iom.int> | **e-mail:** [ritorno@iom.int](mailto:ritorno@iom.int)

# "Xizmetguzariyên Nexşeya Cuma (Juma) ya taybeti penaberan"

## Pekhati ji aliye Civata (ARCI) û bi piştevaniya Komiserya Bilind ya NY di warê penaberan da (UNHCR)

**Hejmara telefona belaş jibo daxwazker û kesên xudane Piştevaniya Navneteweyî û Mirovhezîyê 800 905 570**

**Malper:** <https://www.jumamap.com/>

*Di vê malperê da (Ku bi zimanên Italî, Fransî, Inglîsî, Erebi û Elmanî), tu di kari bi asanî agahî û hurgilliyên tekilî girtinê yê rêkxistinê sazîyên ku dikarin di warê wergirtinê, lê miqatebuna tendurustiyê, dibistana Itaiyanî, alikariyên rêveberî û mafzani, alikariyên derunnas-civakî û bi giştî navendên dijî neşê bikaranîna zayendî, li seranserî Italya alikariya te bikin, bi dest bixi.*

## Hejmara telefona belaş ya taybeti tekoşîna dijî derbazkirina mirovan ya der zagonî:

Di beşa derfetên beranber - Serokatiya Konseya Weziran  
**Hejmara telefona Belaş- 800 290 290**

*Ev navend bi awayê 24 demjimêran şev û rojê û 365 rojên salê bi awayê nenas, hevî li gel xebatkarên çendzimanî û pîspor çalak e.*

## Telefona taybeti Navenda Neteweyî ya tekoşîna dijî Neşê bikaranîna zayendî:

Di beşa derfetên beranber - Serokatiya Konseya Weziran  
**Telefon 1522**

*Ev navend bi awayê 24 demjimêran şev û rojê û 365 rojên salê bi awayê bê pere û hevî li gel xebatkarên pîspor di warê piştevaniya ji kesên rastî bi ne bikaranîna Zayendî û Ne bikaranînen tekildari wê, çalak e.*









